Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1292 | 23-Tîrmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Dîroka wênekêşiyê



**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Ji serdemên kevnar, sedsala 4 û 5'an de hîmê hunera wênekêşiyê bi şêwazê kilasîk hatiye danîn. Herwiha mirovan ev hunera herî bi bandor, bi amûrên wênekêşiyê dikarîbûn li pêş bixin da ku wêne û dîmenên rojane derxînin ji civakê re.**

### Dîroka wênekêşiyê di serdemên kevnar de

Wênekêşî hunereke ku bi riya amûran wêne û dîmenên cîhanê di nav re jî, mirov, hemû, bûneweerê, xweza û hwd…, tê girtin. Ev huner bi teknîka xwe ji destpêka vedîtina wê heya roja îro li gorî serdema xwe hatiye bikaranîn. Ji serdema kevnar ve pêşbingehên wênekêşiyê û amûrên dîtbariyê hatine vedîtin. Di sedsala pêncem û çaremîn ên berî zayînê de, fêlosofên Çînî wekî Mo Dî û yê Yûnanî wekî Aristo hin nirxandin li ser teysandina ronahiyê û çêbûna wêneyan di deverên tarî de kirin. Piştre ev yek bû hîmê pêşketina kamîreya tarî (Camera Obscura). Di sedsala 11'an de, zanyar Hesen Ibn Heysem, Kamîreya Tarî bi awayekî zanistî pêş xist. Ev kamera bi riya kuneke biçûk ku ronahî tê re derbas dibe odeyeke biçûk ji bo wêneyekî terz ango qulipandî derdixist. Ev kamîre wê demê nikarîbû wêneyan bikişîne, tenê şêweyê tiştan nîşan dida, paşê çavik ji bo çakkirina asta zelalbûna wêneyan hat bikaranîn.



### Yekem wêneyê ku hat kişandin

Di 1794'an de, Robert Barker sînemaya panûramîk ya yekemîn çêkir, di 1826'an û 1827'an de, Cozêf Nîsfor Nîps wekî mirovê yekemîn wêneyê domdar ku navê rêbazê wê heliographî bû, kişand. Heta ku ew wêne hat kişandin seetên dirêj domand. Di 1837'an de, Louis Daguerre rêbazê wênegirtinê ya Daguerreotype çêkir, dikaribû wêneyên domdar û zelal bi vî rêbazî bikişîne û di demeke kêm de. Ev rêbaz bû yekemîn rêbazê wênekêşiya fotografî. Herwiha di 1840'î de, Alexander Wolcott xelatek ji bo afrandina yekemîn rêbaza Amerîkayê ya wênekêşiya fotografî, wergirt. Piştre di 1841'ê de, William Henry Fox Talbot kargêriya Calotype saz kir, bi riya wê jî derfet li pêşiya çêkirina gelek kopiyên ji wêneya hat çêbû. Di sala 1843'an de yekem reklameke bazirganî li Filafîdiya hate çêkirin, ev yek jî bi riya belavkirina wêneyekî.

### Yekem kamîre

Amûrên teknîka wênekêşiya bi awayekî bi lez pêş ve çû. Di sala 1851'ê de, Frederick Scott Archer rêbaza Collodionê ya nimandî çêkir. Di sala 1859'an de, kamera ya panoramayê ya yekemîn hat çêkirin. Di 1861'ê de jî, Oliver Wendell Holmes amûra nîşandana wêneyê 3D (sêrû) çêkir. Di 1865'an de, mafê derhîner an jî wênekêş hat parastin. Di sala 1871'ê de, Richard Maddox rêbaza tabloya zuha li pêş xist, dikaribû bi rêya Piromîda AG (zîv) wêneyan bigire bêyî ku wêne were şuştin. Piştî wê di sala 1880'î de, Kompaniya Eastman Dry Plate hate damezrandin, piştre navê wê bû Eastman Kodak. Heriwiha di 1884'an de, George Eastman filmê fotografî çêkir û di 1888'ê de kamîreya ya Kodak ya yekemîn hat çêkirin.

### Pêşxistina kamîreyan ji 1940'î heya serdema heyî

Ji ber pêşketina cîhana teknenolojî û pêwîstiya ku dihat xwestin, mirov neçar bû ku pêşxistinê di qada wênekêşiyê de biafrîne. Ji ber vê yekê jî di sala 1900'an de, kamîreya Kodak ya Brownî derket. Di 1913 heya 1914'an de, kamera ya yekemîn ku filmê 35 mm tê kişandin, hat pêşxistin. Di sala 1927'an de, leed ango lempe ya nû hatî afirandin û di 1932'an de, îşqa fotoelektrîk hat çêkirin. Piştre di 1935'an de, Kodak fîlmê bi navê 'Kodachrome' weke yekemîn fîlmê rengîn weşandin. Herwiha di sala 1948'an de Kompaniya Polaroyd yekem Kamîreya Yekser afrand, ev kamîre piştî çend xulekan ji mirov re çap dikir û derdixist.
Piştê wê di 1973'an de, Polaroid SX-70 hat pêşkêşkirin kamera ya bi awayekî yekser wêne derdixist. Di 1984'an de, Canon kamera ya dijîtal ya yekemîn 'Still Video Camera' çêkir. Di 1990'an de, Kodak diskê CD ya dijîtal ya wêneyan pêşkêş kir. Jê bi şûn de her kompaniyeke kamîreyan nifşên kamîreyan û alavên teknîka hunera wênekêşiyê nûjen kir bi demê re.

### Mobayla xwedî çavik

Di 1999'an de, Kompanya Kyocera a Japonyayî mobaylê yekemîn bi navê 'VP210' afrand, ev mobayl xwedî çavika kamîreyan bû û di wê demê de ronesanseke wênkêşiyê û cîhana dijîtalîk çêkir, herwiha rê li ber çêkirin û pêşxistin mobaylên xwedî çavikên cihêreng vekir, piştî wê kompaniyên wekî Nokya, Apple, Sammsung û hwd... Di roja îro de her kes bi mobaylên pêşketî xebata wênekêşiyê dike, lê dîsa di warê piratîkî û fermiyetê de dest ji kamîreyan û wênekêşiyê nayê berdan.

## FERHENGA BIWÊJAN

### LI SER BAŞBÛNA LI BER ÇAVAN

**Bila zikê melê bel be bila giya û pel be:**
- Ya girîng ew e ku li ber çavan baş xuya bike, cewherê wê ne girîng e.

**Her jina bi xemil û xêz ne xatûn e:**
- Her tişt bi xemil û xêzê nabe.

**Her jina tenûrê dade ne nanpêj e:**
- Çi kesê karekî bike ne pisporê wî karî ye.

**Honik xuya dike lê ne wisa ye:**
- Mirovekî feqir, melahîm xuya dike lê di rastiyê de ne wisa ye; cirnexweş e.

### LI SER GUHNEDANÊ Û ISRARA DI YA XWE DE

**Bilûra li ber ga ye:**
- Tiştek bi serê wî nakeve; guhê xwe nade gotinan.

**Bilûra destê şivan e:**
- Bi heman wateyê.

**Birincê mala Xeyda ye, sê salan bi dar ve maye:**
- Ji bo kesên di tiştên bêsûd de israr dikin tê gotin.

**Devê min ziwa bû:**
- Min pir got; ji gotinê westiyam. (Dema yek tiştekî pir dibêje lê ti kes guhê xwe nadiyê hingê dibêje)

**Dev nedayê:**
- Guh nedayê; jê re dananî.

**Di guhekî re diçe di guhê din re derdikeve:**
- Guhê xwe nadiyê; guhdarî nake; jê re ne girîng e.

**Ev erd bibe ezman:**
- Dinya xirab bibe, qiyamet rabe; çi dibe bila bibe.

**Ez dibêjim kemançe tu dibêjî demance:**
- Ez behsa mijarekê dikim tu guhê xwe nadî min, tu behsa mijareke din dikî.

**Ez çi dibêjm tembûra min çi dibêje:**
- Tu guhê xwe nadî min; ez behsa tiştekî dikim tu behsa tiştekî din dike.

**Ez tirnîniyê ji te re dibêjim, tu yar hezokê li min vedigerînî:**
- Tu guhê xwe nadî min; tu li gorî xwe dikî.

**Gav neavêt:**
- Guhê xwe neda biryarê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1292 | 23-Tîrmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Çar Pêşengên Şoreşa Jinê



**Şoreşa Rojava bi ked û xwîna hezarên şehîdên jin gihaştiye salvegera 13'emîn. Gelek jinan di qada siyasî, rêxistinî û leşkerî de pêşengtî li ser asta herêmî û navnetewî kirine. Ji pêşengên jin ku bûne sembola jina azad; Yusra Derwîş, Menîce Heyder, Ivana Hoffmann û Yadê Eqîde ye.R-2**

## 'Hikumeta veguhêz a Şamê rê dide DAIŞ'ê ku xwe zindî bike'



Berdevkê Fermî yê QSD'ê, Ebcer Daûd diyar kir ku xeteriya DAIŞ'ê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya Sûriyê zêde bûye. Herwiha Daûd destnîşan kir ku hikumeta veguhêz a Şamê rê dide DAIŞ'ê ku xwe zindî bike û kiryarên ku niha li Sûriyê dibin vê yekê tekez dikin.**R-4**

## Dîmenên Rêber Apo, ji bo gel û zarokan hêz bû



Şênî û zarokên bajarê Qamişlo destnîşan kirin ku dîtina Rêber Apo piştî 26 salan rojeke dîrokî bû û gotin, "Dîtina Rêber Apo ji bo me cihê hêz û moralê bû, herwiha em ê asta têkoşîn û berxwedanê bilind bikin, da ku em Rêberê xwe di nava xwe de azad bibînin."**R-6**

## Keder Hisên: Bi nirxê çandê em hatine parastin




Hevserokê (TEV-ÇAND) yê kantona Cizîrê Keder Hisên diyar kir ku yek ji qadên bingehîn ên ku afrandin, huner û ziman pê ve girêdayî ye, çand e, lê ji aliyê pergala netew-dewlet ve rengbûyîna çandan dihat qedexekirin an tunekirin, ji bo wê Şoreşa Rojava nefesekî jiyanî ya netewan ne.**R-7**

# BI INKAR Û KOMKUJIYAN SÛRIYEKE PIRRENG AVA NABE

Parêzerê Kurd Basil Ebdê destnîşan kir ku hikumeta veguhêz a Şamê siyaseta xwe li ser qirkirin û komkujiyên li dijî pêkhateyan dide meşandin û dixwaze bi navê qonaxa veguhêz Sûriyeke navendî ku di bin desthilatdariya wê de be ava bike û wiha got: "Avakirina Sûriyeke demokratîk û pirreng bi biryareke navdewletî pêk nayê, tenê bi hevgirtina pêkhate û gelên Sûriyê pêkan e."**R-5**





## Gel û civakeke serhildêr: Durzî

Durzî wekî Mezdekîtî, Medî, an Farisî tê nîşan dan. Herwiha nêrînên cûda hene ku ew Kurd in û ji Şengalê hatine herêmê. Lê, ew xwe wekî Erebên rasteqîn dibînin. Ala wan sembola baweriyên wan ên olî ye û tenê di demên girîng de tê bilindkirin; bilindkirina wê pênaseya serhildanê ye. Ew civakek berxwedêr e.**R-3**





**Şoreşa 19'ê Tîrmehê li Siwêdayê jî vejîn dibe!**
Dilyar Cizîrî R-4



**Şaştiyên 102 sal berê dubare nekin!**
Farûk Sakik R-5



**Hêviya jiyana bi hev re**
Rohat Bulut R-6

# Çar Pêşengên Şoreşa Jinê

Şoreşa Rojava bi ked û xwîna hezarên şehîdên jin gihaştiye salvegera 13'emîn. Gelek jinan di qada siyasî, rêxistinî û leşkerî de pêşengtî li ser asta herêmî û navnetewî kirine. Ji pêşengên jin ku bûne sembola jina azad; Yusra Derwîş, Menîce Heyder, Ivana Hoffmann û Yadê Eqîde ye.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Di şoreşa Rojava yê Kurdistanê de, gelek jinên ku pêşengtî ji civakê re dikirin û tu carî serî li hemberê desthilatdariyê netewandin bûn armanca êrîşan.



Yusra Derwêş



Ivana Hoffman



Yadê Eqîde



Menîçe Heyder

**Yusra Derwêş**

Li bajarê Amûdê di sala 1971'an de ji dayik bû.Têkoşîna wê ji qonaxa xwendinê ya seretayî dest pê kir dema ku li dibistanê hemî caran li dijî siyaseta rêjîma Baasê serî radikir, bi taybet ji bo zimanê Kurdî yê ku rêjîmê li hemberê wê sîstema qedexekirinê dida meşandin. Piştî qonaxên dibistanê diqedîne, li Zanîngeha Halebê Wêjeya Fransî dixwîne û di sala 2001 de xwendina xwe bi dawî dike. Di nava xwendinê de tevlî Koma Agrî ya hunerî bû, di salên 1990'î de xebata çand û hunerî cîh digre, di heman sale de ew jî wek her jinekî kurd xeyalên xwe yê dîtina Rêber Apo pêk tîne. Piştî Şoreşa 19'ê Tîrmehê dest pê kir Yusra Derwîş ji bo avakirina sîstema perwerdeya zimanê dayikê de xebat da meşandin. Bû mamoste û paşê bû seroka Kombenda Perwerdeyê li Amûdê. Di 1'ê Mijdara 2022'an de, bû hevseroka Meclisa Bajarê Qamişlo, têkildarî avakirina komîn û meclisan xebitî. Di 20'ê Hezîrana 2023'an Yusra Derwîş da ser şopa kerwanên azadiyê, ew li bajarê Tirbespîyê, ji hêla droneyeke dagirkeriya Tirk ve hate hedefgirtin û şehîd bû. Di heman demê de, cîgira wê Lîman Şiwêş û ajokarê wê Firat Danyal jî şehîd bûn. Ew di qada siyasî, civakî, rêxistinî û hwd… de bû pêşenga jinan. Yusra Derwîş, yek ji jinên pêşeng ên Şoreşa Rojava bû û bi xwîna xwe riyeke ronakdar ji bo hemû jinan da xêzkirin.

**Ivana Hoffmann 'Avaşîn Tekoşin Güneş'**

Ew di 1'ê Îlona 1995'an de li Emmrîş Am Rhein a Almanyayê, ji dayikeke Alman û bavekî Togloyî hatiye dinyayê. Di temendê 15 saliya xwe de tevlî xebata siyasî ya çepgiran bûye bi taybet Koma Yong Struggle. Herwiha ew di sala 2014'an de tevlî Partiya Komînîst a Markisî- Lînînî ya Tirkiyê(MLKP) bûye. Ji ber ku ew şoreşger û azadîxwaz bû, di dawiya 2014'an de bê agahîya hevalên xwe, ew hat Rojavayê Kurdistanê. Armanca wê ew bû ku azadiyê, mafên mirovan û enternasyonalîzmê pêk bîne. Ew yekem jina enrnasyonal a şoreşgere ku tevlî YPJ'ê dibe. Piştî çend mehan di nav refên YPJ'ê de têdikoş, di 7'ê Adara 2015 de li Tell Temir e, ew di şerekî li hemberî çeteyên DAIŞ'ê de şehîd bû. Ivana Hoffmann bi nasnavê 'Avaşîn Tekoşin Güneş', bû simbola diyar ên têkoşîna navneteweyî û jineolojî yên Rojava ku bi nasnameya xwe ya Afrîqî Alman hate Rojava û li ser xeta şoreşa rast bû pêşenga jinên şoreşger ên enternasiyonal ên Şoreşa Rojavayê Kurdistanê.

**Şehîd Yadê Eqîde Osman**

Eqîde Osman di sala 1966'an li Girêpirê yê girêdayî bajarê Tirbespiyê ji dayik bûye. Şehîd Eqîde li Girêkêlegê zewicye û dayika 5 zarokan e. Ew Dayikeke welatparêz bû û di wateya fêmkirina şoreşa azadiyê de naskirinên wê yên kûr hebûn, herwiha pêşenga parastina nirxên şoreşê bû. Dayîka Eqîde Mîna dildareke azadiyê tevdigeriya û di mala xwe de jî xwedî sekin û biryar bû dikarîbû weke jineke xwedî zarok hevsengiyekê bike nava mal û xebatê xwe yê rêxistina jinê de. Di axaftina xwe de xwedî gotin bû û rihê wê yê dilgeş her kes hembêz dikir. Ji bo vê fikira azad çend caran ji aliyê rêjîma Baas ve hate girtin, girtina wê jî tu carî hêz û îradeya wê li hember dijmin neşikandiye û her carekê bi rihekî nû tevlî xebatê dibû. Têkoşîna wê û rêhevalên wê rihekî zindî ji hezkirina şoreşê re di hundirê her jinekê de avadikir. Bi destpêkirina Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re hesreta bi salan ji dilê xwe derxist û bi şoreşê bextewar bû. Her û her xeyalên wê hebûn, wê rojekê vîna gel bipejire û şoreşekê bi xwe re ava bike mîna jineke şoreşger xwe ji bo şoreşê esas didît û mîna pêşenga şoreşê amadebû li pêşberî civakê. Xwedîtina di nava watedariya şoreşê de ji bo hemû dayîkan serkeftina herî mezin bû. Wê di Meclisa Edaleta Jin cih digirt, ji ber ku armanca wê ya sereke parastina mafê jinan bû. Giraniya barê şoreşê dayîkên weke Eqîde hilgirtin ser milê xwe, ji ber ew jinên xwedî tecrûbe bûn û hertim di wî rihê xwe de ev ji me re didan nîşandan. Rawestandin ji wan re tune bû û armancên wan her serkeftin bû. Dayika Eqîde ne tenê pêşenga şoreşê bû, lê belê bi vî rihî zarokên xwe jî tevlî refên şoreşê kirin û li pêşiya biryarên wan nedisekinî. Tevgera wê zindî bû û her jin hînî rihê tolhildanê dikir heyanî gihîşete asta şehadetê. Dayika Eqîde bi kerwanê sivîlan re bi armanca piştgiriya şervana berê xwe dabû bajarê Serêkaniyê û li wê derê heya deqa dawiyê dirûşmeyên serkeftinê digotin. Lewma jî dewleta Tirk di 13'ê Cotmehê de bi êrîşên hewayî kerwanê sivîlan topbaran kir, di encamê de dayika Eqîde şehîd bû.

**Şehîde Minîce Heyder**

Minîce Heyder di sala 1977'an de ji dayik bû, di nav malbatek nistîmanperwer de li ser felsefeya Rêber Gelê Kurd Abdullah Ocalan mezin bû. Ew di rastiyê de bû nimûneya jinê azad. Ji destpêka şoreşa Rojava bi awayekî ber biçav beşdarî têkoşîna jinan bû. Di sala 2013'an de bû endama Kongra Star da ku dest bi xebata parastina mafê jinan bike. 4 salan bû berdevka Kongra Star li Qamişlo û hem jî berdevka Komîteya Civakî ya li asta Rojava. Paşê bû hevalseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) li Kantona Cezîre. Minîce hem wek daykekî gerîla hem jî wek jineke welatparêz heta dawiyê bi axa xwe ve girêdayî bû hêz û hêviyên xwe hemî berdan xizmeta têkoşîna azadiya jinên Rojava, heta ku di 18'ê Çileya 2025'an de li Bendava Tişrînê di encama êrişên dagirkeriya Tirk de şehîd bû.

## 'Projeya Rêveberiya Xweser serkeftî ye û dikare li Rojhilata Navîn piratîze bibe'

**Esma Mistefa/Qamişlo**

**Dr. Fernaz Atiye Yûsêf Pispora Karûbarên Siyasî li Misrê da zanîn ku Şoreşa Rojava xaleke veguhêr di dîroka Rojhilata Navîn û tevahî cîhanê de bû û got, "Em û civaka Ereb; tecrûbeya jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, tecrûbeya jin di Rêveberiya Xweser de û bingeha hevbeş û sîstema hevserokatiyê pir bi qîmet û bi nirx dibînin".**



Şoreşa Rojava mohra xwe bi rengê jina têkoşer û serhildêr a ku li hember hemû cûre û rengên tundî û tunekirina jinê li cîhanê hatiye sepandin, lêda. Bi vê yekê bi pêşengtiya jina Kurd li Bakur û Rojhilatê Sûriyê şoreşa guhartina hişmendî û qalibên civakê hate pêkanîn. Dr. Fernaz Atiye Yûsêf Psporê Karûbarên Siyasî ji Misrê bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû.

**Şoreşa Rojava ango Şoreşa 19'ê Tîrmehê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, wekî Şoreşa Jinan tê zanîn. Ev şoreş zêdetirî 13 salan e ku bi pêşengiya jinên ku wêrektiya xwe nîşan dane û di hemû waran de şopa xwe hiştine, berdewam dike. Hûn vê şoreşê çawa dinirxînin?**

Şoreşa Rojava xalekekî veguhêr di dîroka Rojhilata Navîn û a tevahî cîhanê de bû. Ji ber tê de rewşa jin ji bingeh de hate guhartin, hebûna jin di hemû aliyên jiyanê û civakê de hate dîtin. Her wiha li ser bingeha hevjiyana azad, jin û mêr di nava civakê de xwebirêxistin kirin.

Mînaka herî mezin a ku vê şoreşê mohra xwe li Rojhilata Navîn û cîhanê jî xistiye, ew e ku ji 13 salan ve ev şoreş tê berdewamkirin. Bi vê yekê ev yekemîn şoreşe ku di serdema nûjen de li hember hêz û zihniyetên radîkal û netew-dewlet bi ser ketiye ye.

**Projeya Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku ji bîrdoziya Neteweya Demokratîk a Rêber Abdullah Ocalan îlhamê digire, modela guncaw ji bo rêveberiyê temsîl dike. Jinan bi rêya sîstema hevserokatiyê û temsîliyeta di sazî û dezgehên rêveberiyê de roleke girîng dilîzin. Jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê heta çi radeyê ji bo jinên rêxistinkirî û têkoşer li Rojhilata Navîn û li çar aliyê cîhanê bûne modelek? Û ev model heta çi radeyê ji bo hemû jinan dibe modela çareseriyê?**

Ev şoreş girîngiya projeya Netewa demokratîk ji me re dide xuyakirin ku ev proje ne tenê projeyekî anjî tawreke, lê belê projeyekî ku li ser erdê ketiye pratîkî û bi ser jî ketiye ye. Her wiha bi vê serkeftinê tekez dibe ku dikare li tevehî cîhanê ev proje bê pratîzekirin. Di aliyê rola jin di şoreşê de, jin êdî bûye modela ku em pê serê xwe rakin û bûye cihê serfiraziyê. Bi taybet di sîstema hevbeş de ku sîstema hevserokatiyê yekemîn modele ku li cîhanê tê dîtine vê sîstemê cewher û heqîqeta ku ev proje li tevahî cîhanê bê pratîkkirn, tekez kir. Bi taybet hebûna her du zayendan di hundir sîstem, deste û saziyan de, gavekî gelekî pîroz e, her wiha ku jin dikare bi vê yekê mafê xwe misoger bike, bibe hêza çareseriyê û îradeya wê di her beşê civakê de derkeve.

Ev yek dibe çareserî ji hemû pirsgirêkên civakê û yên jin re, ji ber di aliyê din de em dibînin ku mêr herî zêde xwe îfade dike û vê yekê jî bi zihniyeta zilamparêzî dike. Ev proje û sîstem hemû pêdiviyên civakê ger mêr dibe ger jin dibe ji aliyê nîtelîk ve pêk tîne û dibe sîstemeke hevseng ku mafê tu kesî tê de winda nabe. Bê guman modela demokratîk û sîstema hevserokatiyê a ku di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de di sîstemên kanton, sazî û desteyan de hatine avakirin, serkeftineke mezin bidest xist û dibe projeya herî serkeftî a rêvebirin û mafdayêna jinê di aliyê xwe îfadekirin û azadiyê de. Ev tecrûbe dikare li hemû cîhanê pêk bê ne tenê di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de.

Yek ji xalên girîng yên vê projeya cêhwaz jî, xweparastina cewherî ye. Xweparastin; ev tecrûbeya yekemîne ku jina Kurd pêşengtiya wê dike û dibe hêza parastina civakê. Helbet ev tecrûbe serkeftineke mezin bidestxist, bi nêrîna me be ger ne ji van geşedanên siyasî û leşkerî yên li herêmê ba, ev model dikarî li gelek welatên din jî pêk bihata.

**Nêrîna civaka Ereb bi taybetî ya Misrê, ji bo jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, yên ku felsefeya "Jin, Jiyan, Azadî" pejirandine, çi ye? her wiha jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê çawa bandor li jinên Ereb kirine?**

Hûn dizanin ku tecrûbeya ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê a ji bo jin atiye avakirin, di cîhanê de ne tecrûbeya yekemîn e. Mînak Misir yek ji dewletên ku têkoşîna jin tê de hatiye meşandine, her wiha komeleyên ji bo jin hebûn û hwd. Li ser wê bingehê tecrûbeya jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tecrûbeyeke ku hemû jinên Misrî nas dikin û fem dikine, her wiha têkoşîna wan bi nirx dibînin, ji ber ku beriya tevgerên azadiyê em jî di vê rewşa dagirkeriyê re derbas bûn. Ji lewra em û civaka Ereb; tecrûbeya jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, tecrûbeya jin di Rêveberiya Xweser de û bingeha hevbeşî û sîstema hevserokatiyê pir bi qîmet û bi nirx dibînin. Em li hember vê sîstemê xwe ditewînin. Bi taybet di dema heyî de jin gelek astengiyan dibîne ku mafê xwe bi dest bixe û jin bighîne azadiya xwe a rastteqîn ku jin ne li hember tunekirina mêr radibe ser piyan, divê ev hişmendî di cewherî wê a rast de were nirxandin û zanîn. Ji ber wê jî ev proje û sîste, sîstema ku divê em jê re rêzî bigrin û bi hurmet nêz bibine.



# Keder Hisên: Bi nirxê çandê em hatine parastin

Hevserokê (TEV-ÇAND) yê kantona Cizîrê Keder Hisên diyar kir ku yek ji qadên bingehîn ên ku afrandin, huner û ziman pê ve girêdayî ye, çand e, lê ji aliyê pergala netew-dewlet ve rengbûyîna çandan dihat qedexekirin an tunekirin, ji bo wê Şoreşa Rojava nefesekî jiyanî ya netewan ne.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Derbarê parastina çandê de, Hevserokê Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamyayê (TEV-ÇAND) ya Kantona Cizîrê Keder Hisên bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Ji bo her gelekî çand xwedî çi girîngiyê ye, herwiha Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji bo qada çandê xwedî çi girîngî bû?**

Ji destpêka Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ve yek ji qadên bingehîn ên ku afrandin, huner û ziman pê ve girêdayî ye, çand e. Bi lidarxistan şoreşê re ev qad hinek xwe li ser piyan girt. Ji ber ku beriya şoreşê wekî ku ji her kesî re xuyabû dewletekî yek reng, yek ziman, yek al û hwd... ji awayên yekbûyînê dihat meşandin. Her dem li ser rengbûyîna netewan qedexekirin û tunekirin berdewam bû. Li ser asta Sûriyê bi taybet biaxivin ji 5 an 6 netew, ziman û rengên ku li ser vê axê jiyan dikirin, hemû bi netew-dewlet, sîstem û qanûnan ve hatibûn qeydkirin. Lê nefesekî jiyanî ya netewan bi şoreşê re û heta roja îro tê jiyankirin ku me karî li ber xwe bidin û bi avakirina sazîbûna çandê ev tenê ne têrkere. Ji bo wê di aliyê ragihandin, çand, huner, perwerde, avakirina ekadimî û peymangehên çandî û hunerî, zanist hinekî pêş ket. Em bi bîra her kesî/ê jî bînin ku ev yek bi fikir û felsefa Rêber Apo ye. Li kêlek van pêşketinan jî îro roj ji dibistanê heya Zanîngehê wekî çand û exlaq heye û hatiye rûniştandin. Ev jî wê ji bo civakê di demên pêş de xwe li ser bide perwerdekirin û naskirin ku em çawa bi nirxê çandê hatine parastin heya roja îro, bi tayber dayikê çand parastiye, ew jî di rêya ziman, cilûbergên xwe û hwd...

**Beriya şoreşê gelê Kurd nikarîbûn bi nasnameya çandî xwe îfade bikin, lê îro roj parastina çandê bi çi rengî ye?**

Dibe ku parastina çandê di malê de hatibû sînordarkirin û asêkirin ku di çarçoveya teng de mabû. Lê sedemên wê diyarbûn dîsa jî netew-dewlet bû, bi taybet ev yek herî zêde li ser gelê Kurd hatibû meşandin, gelê Kurd heya roja beriya Şoreşê jî ku bi nasnameya xwe ya çandî jiyan bike û xwe îfade bikira, tunebû. Ev çarçoveya teng bi şoreşê re hat şikand heta roja îro. Lê hin tişt hene bandera xwe dike, wekî bandora "Şerê Taybet" ku di rêya wê de êrişî ser çandê dikin. Di Kurdistanê de nêzî 27 an 28 şoreşê ku hatibû lidarxistin, hemû armancên wan ku em li ser erdnîgariya xwe bi ziman û çanda xwe rehet jiyan bikin, herwiha bi kom komînaliya xwe bijîn. Lê ev di rêya şerê taybet ku bi taybet di aliyê ragihandinê de tê kirin, reşkirinekê li ser hemû qadan çê dike, hem dixwazin koçberiyê pêş bixin, ev pranî di Kurdistanê de, bi taybet ji aliyên dewletên ku xwe tê de bi cih kirin wekî Firs, Tirk, Ecem û heta yên biyanî bandora xwe li ser nifşên nû û ciwanên me ku çawa bikarin wan ji ziman, çand û kefneşopiyên wan dûr bixin, heye. Niha ev dema ji derketina derveyî welat tê kirin, mîna dema ku ciwanên me diçin Ewropa û welatên dîtir bi zanebûn di aliyê şerê taybet de vê yekê dikin. Ji bo Rojava jî her çiqasî hewl dan wê reş bikin û vala bike, bi vê yekê xwestin di aliyê çande de derbeyekê lê bixin, ji bo wê jî van dewletên ku di Kurdistanê de xwe bi cih kiribû, çanda gelan li gorî xwe bikar anîn, mînaka wê di aliyê hunerî de bihezaran stranên me yên Kurdî berovajî kirin û ji bo berjewendiyên xwe bikar anîn, ev ji bilî berovajîkirina folklor, xwarinên gelerî, kevneşopî û hwd...

**Çanda gelan li ser çi hîmê xwe domandiye û welatê ku ji gelek çandan pêk tê wê çawa prengiya çandên xwe bidin diyarkirin?**

Çanda gelê me û hemû gelan jî ji kedê hatiye, keda çanda me jî ji kevneşopî û amûrên ku bapîr û dapîrên me li ser destan afirandin, da ku debara jiyana xwe pê bikin, ev jî jê re tê gotin çand û heya roja îro jî li ser wê hîmê berdewam kiriye. Niha welatê me li ser hîmê gelên ku lê jiyan dike, tê avakirin. Ji bo wê pêwîst e ku em çawa bikaribin van hemû gelan bi hev re ku her kes bi çand, ziman, reng, cilûbeg û nirxên xwe yên civakî bidin jiyankirin, ji bo ev yek pêk were divê hizra Rêber Apo ya "Çanda Netewiya Demokratîk" ku hemû gel xwe tê de dibîne û bicih dibe, pêk bê. Mînaka wê jî berbiçave di Hevpeymana Civakî ya sîstema nû ya vî welatî de hemû netew xwedî heman girîngiyê ne, bi vê hevpeymanê her kes bi rehet dikare bi nasnameya xwe jiyan bike. Li ser wê bingehê jî gava me ya destpêkê li her mal, gund, bajar an jî tax bi tax maleke çandê ava bikin, berhemên ku ji wê derkevin jî dibin milkê vî gelî, ev jê re karê hevbeş te gotin, ev hevbeşî parastina nirxê gel bi xwe ye, ji ber Kurd, Ereb, Ermen, Suryan, Çerkez, Kildan û hwd...ev hemû ziman, çand û nirxên ku bi hezarên salan li ber xwe dane, da ku ber bi qirkirinê ve neçin. Lewma komkirina van wekî çanda netewa demokratîk a ku Rêber Apo pênase dike ku di bin wê sîwanê de, di nav Rêveberiya Xweser de her kes bi Xwesertiya xwe dikare li ber xwe bide û berheman ava bike, bi vê yekê dibe bersiv ji dijminê xwe re. Êdî yek dewlet me derbas kiriye, lê divê em hişmendiya wê jî derbas bikin. Li ser asta Kurdistanê jî, ji bo parastina nirxê çandê bi yekbûna netewan em ê li ber xwe bidin, ji bo wê jî derxistina projeyên mezin ên li ser asta Kurdistanê divên, ji ber dema berhem tê afrandin dibe milkê civakê.

**Gelo berhemên ku îro roj têne çêkirin, li gorî asta tê xwestin û têrkerin û ji bo asta van berheman hîn bê pêşxistin çi pêwîst e?**

Dibe ku li Rojava bi şoreşê re gelek berhem hatin çêkirin, lê ne têrkerin ji ber beşekî mezin ji civakê hîn ne di wê cûdabûnê de ye, tenê li berjewendiyên xwe yên kesayetî mijol bûne, ew rexne jî li me weke çandê vediger ku pêwîst e em xwe li nav civakê bixin, di rêya komînan, meclisa, tax, gund û malan de.



Dibe ku bi awayekî bilez ev yek pêk neyê, lê di demên pêş de ev wekî plansazîye û ji hemû cihên eleqedarî bi çandê ve tê xwestin. Herwiha gelek rê û rêbaz hene ku bikarin bidehan berheman biafirînin. Bi hev re em dikarin vî karê hevbeş di nava civakê de bidin meşandin, ji komînê dest pê bikin, ji bo wê jî divê komîn werin aktîvkirin ku bikaribin tê de komîteya çandê ava bikin, di wê komînê de kesên bi çandê re eleqedar bi erkê xwe rabe. Em hîn negihane wê astê ku hemû civakê tevlî qada çandê bikin, ji ber ew çand ji wan hatiye jibîrkirin, qedexekirin, windakirin û lîstin. Heta di minhacê dewletê yê ku hatibû çêkirin ji pirtûka refê 1 heya zanîngehê ku di nava pirtûka erdnîgarî yan dîrok de, behsa Kurdistan çand, exlqa, huner û gelek tiştên din nehatibû kirin, tenê li gorî berjewendiyên xwe dabûn nivîsandin. Lê îro ev rastî hemû hatiye xuyanîkirin û hîn jî tê xuyakirin. Li ser nirxên ku em lê digerin hîn jî lêkolîn li ser hene ji bo ku em civaka xwe bi resenbûna bidin naskirin. Berî vê şoreşê em jî ne di ferqa van tiştan de bû, ev jî rastiyeke ku me digot li ser tiştên kevin tiştên qediyaye û em ber bi sîstema kapîtalîzmê ve dimeşiyan û tê de xeniqî bûn, heta ku şoreşa 19'ê Tîrmehê lidar ket. Di salên 80'î de bi derbasbûna PKK'ê ji Rojava re hişyariyeke çê bibû, lê wê demê hemû civak pê şiyar nebû. Şoreşa Rojava weke zayînekî teqiya. Lê dîsta jî ev hemû ne têrkerin. ji ber ev tenê wekî erkekî saziyên ku mijolî çandê dibin nine. Ji ber çand di bingeha xwe de nirxekî civakê ye û divê civak jî bi vî karî rabe. Ji bo wê divê em hemû bi hev re alîkar bin ku bi xwe lê xwedî derkevin, xweberpirsyarê çanda xwe bibînin û destpêkê li çanda xwe xwedî derkevin, paşê yên din jî nas bike û bi wan re jî karê hevbeş bikin.



# Dîmenên Rêber Apo, ji bo gel û zarokan hêz bû

Şênî û zarokên bajarê Qamişlo destnîşan kirin ku dîtina Rêber Apo piştî 26 salan rojeke dîrokî bû û gotin, "Dîtina Rêber Apo ji bo me cihê hêz û moralê bû, herwiha em ê asta têkoşîn û berxwedanê bilind bikin, da ku em Rêberê xwe di nava xwe de azad bibînin."

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Piştî 26 salan, Rêber Abdullah Ocalan cara yekemîn ji girtîgeha li girava Îmraliyê bangeke bi dîmen kir. Ev bang di çarçoveya banga Aştî û Civaka Demokratîk ya 27'ê Sibatê de hat kirin. her wiha ev banga Rêber Apo ya bi dîmen hat belavkirin, ji bo tevahê gel û zarokan cihê kêfxweşî û şanazê bû.

Di derheqê peyama Rêber Apo ya bi dîmên dayik, bav û zarokên bajarê Qamişlo, ji rojnameya me re axivîn.

Necah Omer di destpêka axaftina xwe anî ziman ku ew bi dîtina dîmen û banga Rêber Apo gelekî kêfxweş bûn û wiha dewam kir: "Ji ber ku me bi awayekî zindî dit ku rewşa Rêber Apo bi çi awayî ye, dilê me rehet bû, di heman demê de me naskir ku rewşa Rêber Apo ya tendirûstî baş e. Guhdarkirina dengê Rêber Apo û temaşekirina dîmenên wî ji bo me gelekî hêz bû. Em ji Rêber Apo bawer in ku îro bi saya wî rewşa me Kurdan gelekî cudatir û baştir e. Em hêvîdar in ku wê tiştên baş çêbibin. Rojeke dîrokî bû. Piştî 26 salan ji îşkenceyên di girtîgehên dewleta Tirk a dagirker de, me Rêber Apo bi dîmen û deng dît, ev jî cihê moral û kêfxweşiyê ye."

**'Azadiya Rêber Apo azadiya jin û civakê ye'**



**Necah Omer**

Necah Omer di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Em weke jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hewl didin ku bi fikir û bîrdoziya Rêber Apo xwe pêş bixin. Bi vî awayî em ê bibin xwedî hêza pêkanîn. Divê her kes zanibe ku em hemû Apoyî ne. bêguman piştî ewqas sal dema ku me dîmenê Rêber Apo dît û dengî wê hat bihîstin. Her gotineke Rêber Apo ji bo me perspektîf e, ji ber vê yekê em heya dawî li ser şopa fikrê Rêberê xwe bin û asta tekoşîn û berxwedanê em bilind bikin. Azadiya Rêber Apo azadiya me ye, azadiya jin û civakê ye."

**'Em her dem tiyê felsefeya Rêber Apo ne'**

Di heman çarçoveyê de welatiyê bi navê Riyad Emîn diyar kir ku piştî 26 salan wan deng, dîmen û rengê Rêber Apo dîtin û ev ji bo wan rojeke dîrokî ye û wiha



**Riyad Emîn**

got: "Em gelekî kêfxweş û bi kelecan in. Me dît tenduristiya Rêber Apo jî baş e, kêfxweşî û kelecanek gelek mezin ji me re çêbû. Nirxandin û axaftina Rêber Apo ji bo civaka me gelekî bi wate ye. Em ê heta dawiyê li ser fikrê Rêber Apo bin û xwe mezin bikin, bêguman ji 7 salî heta 70 bi dîtina Rêber Apo kêfxweş bûn. Em her dem tiyê felsefeya wî ne û di riya kûrbûna di nava vê felsefeyê de em ê bigihîjin azadiya fizîkî ya Rêber Apo."

**'Serkeftin wê ya me be û banga Rêber Apo ji bo hemû cîhanê wê bibe çareserî'**

Riyad destnîşan kir ku banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokiratîk, ne tenê ji bo kurdan e, lê belê ji bo tevahî cîhanê ye û wiha domand: "Fikrên Rêber Apo ji bo hemû gelan in. Em li ser fikrên Rêber Apo xwe bi rê ve dibin û axa xwe diparêzin. Her çar parçeyên Kurdistanê bi wan fikran xwe bi rê ve dibin. Em ji Rêber Apo bawer in. Em hêvî dikin piştî vê pêvajoyê serkeftin wê ya me be û ji bo hemû cîhanê bibe çareserî."

**'Hêviya me mezine ku Rêber Apo di nava xwe de bibînin'**

Zaroka bi navê Feraşîn Elî jî hestên xwe yên kêfxweşiyê dema ku dîmenê Rêber Apo dît anê ziman û got: "Ez li dîmenê Rêbertî mêze dikim dibêjim ku bi hêviya ku em te dinava xwe de wiha zindî zindî bibînin. Dîmenê Rêber Apo ne tenê dilê me şad kir, lê belê dilê tevahê zarokan şad kir. Em zarokên pir bi şensin ku me Rêber Apo bi dîmen dît û em bawerin ku emê wî zindî jî bibênin."

**'Rêber Apo ji bo me hêze'**

Zaroka bi navê Zevîn Omer destnîşan kir ku ew hêz û morale xwe ji Rêber Apo digirin û wiha pê de çû: "Em bi dîmenê Rêber Apo gelekî kêfxweş û şanaz bûn. di heman demê de me hêzekî pir mezin ji Rêber Apo girt, em wekî zarokên Rojavayê Kurdistan her li pey şopa fikir û felsefeya Rêber Apo bin, ji ber ku Rêber Apo riya me ronî kir û pêşeroja me yê zarokan jî diyar kir."

# Ji bo jîngeheke saxlem Desteya Jînegehê xebatan berfireh dike

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Hevseroka Desteya Jîngehê li Bakur û Rojhilatê Sûriya Besma Mihemed diyar kir ku ji bo pêşxistina zihniyeta parastina jîngehê û girîngiya wê ji bo jiyana mirovan, semîner û perwerdeyên berfireh tên dayîn.**

Di çarçoveya parastina jînegehê de, Desteya Jîngehê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê kar û xebatên berfireh dike, li sr asta herêmê bi giştî pêngav û projeyan cihreng pêk tîne.

Derbarê kar û xebatên Desteya Jîngehê yên di şeş mehên derbasbûyî de hatine kirin, Hevseroka Desteya Jîngehê li Bakur û Rojhilatê Sûriya Besma Mihemed ji rojnameya me re axivî.

**'Li hemberî xeteriya qirkirina jîneghê hişyarî pêwîst e'**

Hevseroka Desteya Jîngehê li Bakur û Rojhilatê Sûriya Besma Mihemed di destpêka axaftina xwe de wihagot: "Weke Desteya Jîngehê erka me parastina jîngehê bi giştî ye, çi di aliyê av û çawaniya bikaranîna wê de be. Herwiha parastina axê ji çûlbûnê û bi danîna çareseriyên alternatîf em xebatên xwe berfireh dikin."

Besma Mihemed destnîşan kir ku guherîna avhewayê û zuhayî bandoreke mezin li ser rewşa çandiniyê kir û wiha pê da çû: "Ji ber kêmbarîna barana îsal rêjeya ava çeman pir kêmbûye ev sedem dihêl xeteriya qirkirina jîngehê zêde bibe, lewma divê mirov di vî alî de hişyar be."

**Sedemên zêdebûna xeteriya li ser jîngehê**

Besma Mihemed diyar kir ku ji ber binpêkirinên ku der heqê jîngehê de pêk tên rêjeya çolbûnê zêde dibe, achewaya herêmê tê guhrtin û wiha berdewam kir: "Avêtina çopê li nav çeman, bîr û rêyên sereke ku ev sedem ji giringtirîn xeteriyên li ser jîngehê çêdike, herwiha bermahiyên şer ku hemû tîrêjên nûklerî ne bi demê re dibe ku karîsetên mirovahî bi xwe re bîne, bandorke neyînê li ser hewa û axê dike, di heman demê de Ji ber avahiyên pîşesaziyê û şewitandinê, lewma divê em cihên keskayî zêde bikin."

**Kar û xebatên Desetya Jîngehê di şeş mehn de**

Desteya Jîngehê projeyek ji bo şopandina qirêjiya jîngehî, projeya daristançêkirin li deverên parastî (Çiyayê Kezwanan), meştel (Çelebiyê li Kobanê), Her wiha li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Meclisa Jîngehê hate avakirin da ku wekî referansek jîngehê xizmet bike û wekî gavek ber bi rêxistina karê jîngehê û avakirina çarçoveyên qanûnî yên pêwîst ji bo wê, reşnivîsek qanûnek jîngehê hate amadekirin. Pêngav di nava komînan de, belavkirina broşoran, hemleyek bi Hêzên Ewlekariya Hundirîn re hate kirin bi armanca çandina daran li rêyan, herwiha bi jinan re hemleyek hatin kirin li gundê Jinwar li kantona Cizîrê.

Li Reqa, Cizîrê û Kobanê Teqîgeh ji bo analîzkirina av û axê hatin vekirin, li Dêrazorê jî amadekariyên temamkirina teqîgeheke din tê kirin.

Besma Mihemed tekez kir ku hemleyên darçandinê hemû cihan hedef digre, sazî, rêyên sereke û di nava civakê de û hîn jî ev hemle tên berdewam kirin.

**Dewreyên perwerdê ji bo hişyarkirina civakê**

Besma Mihemed diyar kir ku 4 dewreyên perwerdê hatin vekirin, Akadîmiyeke ya Desteya Jîngehê ya Bakur û Rojhilatê Sûriya heye, ev akademî desr û semnînerên hişyariyê dide herwiha danasîna jîngehê û giringiya wê û wiha got: "Semîner li zanîngeha rojava, Şerq û saziyên Rêveberiya Xweser hatin dayîn di nava hemleyên me de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê."

**Ji bo pêşerojê pilanên hişyarkirinê**

Besma Mihemed îşaret kir ku ew zêdetir bal dikşînin li ser hişyarkirina jîngehê di nava civakê de û wiha got: "Ji ber ku eger hişyarkirina civakî û jîngehî tune be, ku civak nizanibin jîngeh çiye û çi giringiya wê heye, em naghêjin encamê çiqasî mero daran biçînin û projeyan çêbikin,



ji ber vê yekê em hewil didin di aliyê semîneran de berfirehkirinekê çêbikin, dayîna dewreyên perwerdê ji bo giştî civakê zêde bikin û di aliyê zihniyetê de pêşketinekê çêbikin, ji ber ku parastina jîngehê erkê hemû welatiyan e ji biçûkan heta mezinan."

Besma Mihemed zêde kir ku yek ji zehmetiyên ku li hember wan derdikeve kêmbûna hişyariya civakê di aliyê parastina jîngehê de ye.

**Alternatîf**

Zêdekirina darçandinê ji bo berfirehkirina sektora nebatan, vezîvirandina bermayiyan, hişyarkirin di dibistanan de, çandiniya organîk weke alternatîfa madeyên kîmyewî bikar bînin weke semada organîk ku em li desteyan çêdikin di nava kantonan de.

Hevseroka Desteya Jîngehê li Bakur û Rojhilatê Sûriya di dawî de wiha anî ziman: Di demên pêş de zêdetir em ê bal bikşînin li ser hişyariya jîngehî, em bi hêvî ne ku civak jî bi me re bibin hevkar da ku jîngeheke bi teundirst dûrî nexweşiyan ava bikin."

**Xwenasîn**



## Hêviya jiyana bi hev re

**Rohat Bulut**

Welat ne tenê bi sînorên xwe, lê di heman demê de bi îradeya niştecihên xwe yên ji bo jiyana bi hev re jî tê parastin û li ser pêyan tê hiştin. Li Rojhilata Navîn gelek welat hene ku şopa hezaran salan a şaristaniyên kevnar hildigire. Kurd, Tirk, Ereb, Ermen, Asûr, Suryanî, Çerkez û gelek neteweyên din di bin heman ezmanî de bi hev re jiyane û dijîn. Ew herwiha welatek e ku ji hêla cihêrengiya baweriyan ve wekî mozayîkekê ye. Misilman bi bangên meleyan diçin mizgeftan, Xiristiyan bi denê zingilê Dêrê diçin dêrê, Ehlê Rêya Heq bi dengê tembûrê radibin semahê û li gorî baweriyên xwe îbadetên xwe dikin.

Lê jiyana bi hev re ne tenê bi sekinandina li kêleka hev çêdibe. Jiyana bi hev re; bi bihîstin, têgihîştin û naskirina hev dest pê dike. Ev bingeha jiyana demokratîk e: bi hev re jiyan bi cûdahiyên xwe, wekhev û azad jiyîn, bi rûmet û nasnameya xwe jiyîn wateyê digire. Li ser vê axê tiştên ku qewimîne, êşên mezin ên ji ber tunekirin û tunehesibandinê, ji ber polîtîkayên pişaftinê, ji ber zor û zordariyê rû dane nîşanî me daye bê rê li ber çi vekiriye. Ji ber vê yekê, bêyî ku em paşeroja xwe înkar bikin, lê em neçarin ku bi awayekî wekhev û adilane pêşeroja xwe ava bikin.

Çanda bi hev re jiyîn; encax bi wekhevî û rêzgirintina li pêşberî mafên hev ên mirovî û civakî pêkan e. Ziman, ol, mezheb an nasnameya etnîkî ya tu kesî ji ya din bilindtir nîne. Elewîtî ne gef e, ne jî Kurd û nasnameya Kurdî xeter e. Bi heman rengî ne Ermenîbûn pirsgirêka bi hev re jiyanê ye, ne jî Asûrîtî. Mirovek tenê ji ber ku ew mirov e bi nirx û hêja ye. Nasname tenê rengên ku vê dewlemendiyê diyar dikin in.

Lê exlaq çi ye? Ma ew tenê meseleyek takekesî ye? Na, tam li vir tiştê ku em jê re dibêjin exlaqê civakî dertê pêşiya me.Exlaq, di bingeha xwe de wijdaneke civakî ye ku ji xwe dûr nakeve, mafan diparêze û prensîba avakirina rêziknameyek dadperwer dihewîne. Em îro ji her demê bêtir hewceyê vê yekê ne. Ji ber ku azadî ne tenê dema ku em wê ji bo xwe dixwazin, lê di heman demê de dema ku em wê ji bo yên din diparêzin jî wateya xwe ya rastîn dibîne.

Em ji bîr nekin: azadiya yek gelî ji koletiya gelekî din nayê. Aramiya baweriyekê, bi tunekirin û bêdengkirina baweriyeke din pêş nakeve. Mayîna zimanekî bi paşguhkirina û tunehesibandina yekî din ne mimkun e. Berevajî vê, heke em hemû bi hev re hebin, em ê hemû bihêztir û aramtir bin.

Hêza rastîn a welatekî ne di tank, pere an avahiyan de ye, hêza wî welatî di bawerî û rêzgirtina hevbeş a ku netewên li ser wê erdnîgariyê bi hev re dijîn, ji hev re nîşan didin de ye. Aştiya rastîn ne bi polîtîkayên dewletê, lê bi têkiliyên di navbera kesan, netewan, li kolanan, li dibistanan, li nav zeviyan û kargehan tê avakirin. Welatekî ku her kes xwe lê bi ewle hîs bike, nasnameya xwe veneşêre û netirse, mimkun e.

Ji ber vê yekê divê em çandeke jiyana hevbeş pêş bixin, weke şêwazê jiyanê bipejirînin û biparêzên. Ji ber ku em hemû di bin heman asîmanê de ne û ew asîman ji bo me hemûyan bes e.



# Gel û civakeke serhildêr: Durzî

Durzî wekî Mezdekîtî, Medî, an Farisî tê nîşan dan. Herwiha nêrînên cûda hene ku ew Kurd in û ji Şengalê hatine herêmê. Lê, ew xwe wekî Erebên rasteqîn dibînin. Ala wan sembola baweriyên wan ên olî ye û tenê di demên girîng de tê bilindkirin; bilindkirina wê pênaseya serhildanê ye. Ew civakek berxwedêr e.

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

**- Durzî kî ne?**

Pêkhateya Dûrz mezhebek e ku bingehên wê ji aliyê şaxa Îsmaîlî ya Şîatiyê ve hatine avakirin, lê bi demê re, ji ber tundrewiya wê ya li ser bingeha yekxwedayetiyê û ramanên din, ji Îsmaîlîtiyê veqetiya. Di sedsala 11'an de derketiye holê, ji hêla hînkirinên xelîfê Fatimî el-Hekîm Amrillah ve bingeh girtiye, ku xwedayetiya wî parastiye û wî xweda kiriye.Îsmaîlî, yên ku di sala 909'an de Dewleta Fatimiyan damezrandin, di fermîkirina koma olî ya binavê Îsmaîlî û belavbûna wê li seranserê Misrê de roleke girîng lîstin. Lê, bi serdestiya xelîfeyê 6'emîn yê Dewleta Fatimiyan û melayê 16'emîn yê Îsmaîlî, Ebû Elî Mensûr û Hekîm bî Emrillah di sala 985 û 1021 de, di derbarê baweriya bi Xwedê, xwedayî, vejîn û pratîkên olî de dabeşbûn destpê kirin. Mezhebek ezoterîk li ser bingeha xwedayîtiya ku ji Ebû Elî Mensûr re tê veqetandin derket holê. Navê vê mezhebê, ku wekî pêkhateya Dûrz tê zanîn, ne ji Ebû Elî Mensûr, lê ji xalê wî, Mihemed ibn Îsmaîl Neştekîn el-Derazî re tê vegotin. Durzî di eslê xwe de ji Dewleta Fatimî, Îsmaîlî û ji ber vê yekê jî Heft Îmam (Seb'iye) ne. Lêbelê, cudahiya wan ji Heft Îmam ew e ku ew Xelîfeyê Fatimî yê Misrê, el-Hekîm bî-Amîrîllah, wek Xwedê û cîgirê wî, Hemze ibn Elî, wek pêxember dibînin. Bingeha wan wekî Mezdekîtî, Medyayî an Farisî tê binavkirin. Her wiha nîqaşên cidî hene ku ew Kurd in û ji Şingalê hatine herêmê. Lê, ew xwe wekî Erebên paqij dibînin. Ala wan sembola baweriyên wan ên olî ye û tenê di demên girîng de tê bilindkirin; hejandina wê pênaseya serhildanê ye. Ew civatek şerxwaz û berxwedêr in.

Durzî bi dîrokî bi komên Şîa re, bi taybetî Îran û Hizbullahê re, peywendîyekî dûr parastine. Sedemên bingehîn ên vê dûrbûnê hem civakî û hem jî siyasî ne. Tevî kokên xwe yên Îsmaîlî, Durz xwe li derveyî Îslamê digirin û baweriya Şîa red dikin. Ev cudahiya teolojîk bingeha helwesta wan a parastî ye, nemaze di derbarê tawanên Îranê yên ji bo serokatiya olî de. Peywendiya wan bi Hizbullahê re tevlihevtir bûye. Her çend carinan hevkariyên taktîkî di navbera Durzî û Hizbullahê de li Lubnanê çêbûne jî, bêbaweriyek kûr serdest e. Girêdanên nêzîk ên Hizbullahê bi Îranê re û teqezkirina wê li ser nasnameya wê ya Şîa Dûrz nerehet kiriye. Ev nerehetî bi taybetî di pêşengê Durzî yê Lubnanê, Welîd Canpolad de eşkere ye, ku pir caran li dijî hêza zêde ya Hizbullahê hişyariyê dide. Durzî (Durzîe) civatek olî ye ku ji şaxa Şîa-Îsmaîlî ya Îslamê derketiye û bi demê re bûye pergalek baweriyê ya girtî û cuda. Ew bi giranî li Sûriye, Lubnan, Îsraîl û beşekê jî li Urdunê dijîn. Ew xwezayek girtî diparêzin, hînkirinên olî tenê ji bo kesên di hundir de eşkere dikin. Baweriyên wan ji hêla felsefeya Yewnanî, Gnostîsîzm, Îsmaîlîzm û Îslamî ve bandor dibin. Piraniya Drûzên li Sûriyeyê li Çiyayên Durzî dijîn, herêmeke çiyayî û asê li başûrê rojavayê welêt ku ji sedî 90 zêdetir nifûsDurzîin; bi qasî 120 gund bi tevahî ji aliyê Durzîvê tên niştecîkirin. Civakên din ên girîng li Çiyayên Harim, li Ceramana, taxeke Şamê, û li ser çiyayên başûrê rojhilatê Çiyayê Hermon dijîn. Civateke mezin a Durzîyên Sûriyê dîrokî li Bilindahiyên Golanê dijiya, lê piştî şerên bi Îsraîlê re di salên 1967 û 1973'an de, gelek ji van Dûrzan reviyan deverên din ên Sûriyê; piraniya wan ên ku mane li çend gundan di nav axa nakokî de dijîn, lê tenê çend kes li bermahiyên teng ên Parêzgeha Quneytra dijîn, ku hîn jî di bin serweriya bi bandor a Sûriyê de ye.

**Taybetmendiyên Giştî yên Durziyan:**

Pirtûka Wan a Pîroz: Ji nivîsên veşartî yên bi navê "Rasā'il al-Ḥikma" (Peyamên Aqilmendiyê) pêk tê.

Civaka Girtî: Tu kesek ji derve nikare bibe Durzî. Tenê ew kesên ku wekî Durzî ji dayik bûne wekî endamên vê baweriyê têne hesibandin.

Nasname: Ew ji hêla etnîkî ve wekî Ereb têne nas kirin, lê li gelek deveran ew bi gelên xwecihî re di têkiliyê de jiyane.Durzîdi dîrokê de qet xizmetkarên hêzên mezin nebûne; ew bi parastina nasname, bawerî û rêziknameya xwe ya civakî jiyane.

Ya yekem Ji ber vê yekê ew di bin dorpêçkirina domdar de ne, hem ji Împeratoriya Osmanî û hem jî di dema rejîma Sûriyê de. Hêzên navendî her civatek ku piştgrî nade wan wekî "pirsgirêk an jî weke dijmin" ku were tunekirin dibînin. Ya duyemîn, pergala baweriyê ya mîstîk û girtî ya Drûzan wan şaş fam dike. Lêbelê, ev hişmendiya girtî refleksek zindîmayînê ye. Wan baweriyên xwe veşartî hiştine da ku xwe ji komkujî, asîmîlasyon û êrîşên derve biparêzin. Lê, ev wan nake dijmin; berovajî vê, ew wan vedixwîne ku bi hevre jîyan bikin. Di seranserê dîrokê de, ew bi taybetî bi Kurdan re mil bi mil piştgrî kirin e. Ya sêyemîn, perspektîfa Rêber Apo li ser gelêDurzîjî zelal e: Ew dibêje ku ew dikarin pergalên xwe ava bikin û bibin beşek ji civaka demokratîk. Bi taybetî di modela Konfederalîzma Demokratîk de, Durzî pêkhateyekê wxwediyê maf in ku di meclîsên herêmî de xwerêveberiyê bikin. Rêber Apo dibêje, "Bê nasname jiyan nabe." Durzî gelekî ye ku ji bo nasnameya têkoşîn kiriye û berxwedanî meşandiy e. Îro, komên cîhadîst, rejîmên otorîter û lîstikvanên navneteweyî hewl didin ku Durzîyan manîpule bikin an jî bitepisînin. Lê heke gelê Durzî bi Kurd, Elewî, Ermenî û hemû gelên din ên bindest re xeteke berxwedanê ya hevpar ava bikin, ew ê ne tenê xwe biparêzin; ew ê di heman demê de rê li ber jiyaneke azad ji bo gelên Rojhilata Navîn vekin.







**Têkiliyên Kurd û Durzîyan**

Di dîrokê de, ne pevçûnek rasterast û dijwar an yekîtî heye; lê, wekî du gelên ku li heman deverên çiyayî û pirçandî dijîn, bi taybetî li Sûriyê, wan çarenûsên hevdu û zextên civakî yên wekhev jiyane. Kurd û Durzî carinan li Sûriyeyê li dijî polîtîkayên erebkirinê yên dewletê ji bo parastina nasnameyên xwe yên herêmî têkoşin kirin e. Bi taybetî piştî salên 1970'an de, bi rabûna tevgera Kurdî re, hin ciwanên Durzî bi vê têkoşînê re piştgrî nîşan dan. Durzî gelekî ye ku li heman erdnîgariyê bi Kurdan re dijî û rastî polîtîkayên asîmîlasyonê yên wekhev hatiye. Kurd û Durzî ku gelek ol, mezheb û zimanan dihewîne pergala baweriyê ya felsefî li dijî zordariya Osmanî, Baas û dîjî hişmendiya dewleta netewe têkoşiya. Bi heman awayî, lêgerîna wan a xweseriyê hate tepasin û bi rastî qirkirinê hatin. Ev gel hilgirên rastîn ên Rojhilata Navîn in. Ji ber vê yekê, Rêber Apo hevgirtina van gelan wekî erkek dîrokî dibîn.

**Rêberê Gelan Abdullah Ocalan û peywendiya wî bi pêkhateya Durzî re**

Hevgirtina di navbera gelan de û pergala konfederal ya di fikir û ramanên Rêber Apo de cihekî girîng digirin. Di vê çarçoveyê de, nêzîkatiya wî ya li hember gelê Durzî li ser vê perspektîfa biratiyê hatiye avakirin. Di salên 1980 û 1990'an de, dema ku Rêber Apo û kadroyên Tevgera Azadiyê li Lubnanê bi tevgerên Filistînî û Lubnanî yên li Geliyê Bekayê re peywendî danîn, têkiliyên rasterast bi civakên Durzî yên li herêmê dijîn re jî hatin danîn. Di vê serdemê de, hin peywendiyên fermî bi rêberê Durzî yê Lubnanê Welîd Cambolad re hebûn. Li gorî xalên Konfederalîzma Demokratîk û biratiya gelan, her tim girîngî li ser nasname û azadiya Durzî hatiye dayîn. Di Şoreşa Rojava de, bang li civakên Durzî yên li Suweydayê (Cebel el-Durzîî) hatin kirin. Di nav gelên Sûriyê yên ku ji ramanên Rêber Apo bandor bûne de, Durzî jî di nav wan kesan de bûn ku tevlî nava refên YPG'ê bûn. Durzî gelekî ye ku li heman erdnîgariyê bi Kurdan re dijî û rastî polîtîkayên asîmîlasyonê yên wekhev hatiye. Rêber Apo her gav Durzî wekî pêkhateyek di nav konfederalîzma demokratîk ya gelan de hesibandiye. Ew dibêje ku ew dikarin pergalên xwe ava bikin û bibin beşek ji civaka demokratîk. Rêber Apo dibêjê, bawerî û gelên weke Durzî û Elewî neçar in ku di nav netewe dewlet de bên bişaftin kirin. Ji ber vê yekê, modela Netewên Demokratîk ji bo Durzîyan jî derfetekê pêşkêş dike ku bi azad bijîn.

Rêber Apo: "Em nikarin Rojhilata Navîn azad bikin bêyî ku em rastiya ne tenê gelên mezin lê di heman demê de civakên piçûk jî fam bikin."

"Felsefeya PKKê Durzîyan dihewîne, li ser bingeha rêzgirtina ji bo hemî gelan û projeyek hevpar a azadiyê."

"Gelê Durzî yek ji gelên herî kevin û bêhempa yên Rojhilata Navîn e. Mixabin, di nav nijadperestiya Ereb û şerên mezhebî de, ew her gav neçar mane ku nasnameya xwe veşêrin."

"Li Rojhilata Navîn, gel an dê hevdu bifetisînin an jî di bin sîwanekî demokratîk de bi hev re bijîn. Ne Durzî, ne Kurd û ne jî ti gelên din nikarin bi bişaftinê werin xilas kirin."

# ‘Hikumeta veguhêz a Şamê rê dide DAIŞ’ê ku xwe zindî bike’

Berdevkê Fermî yê QSD’ê, Ebcer Daûd diyar kir ku xeteriya DAIŞ’ê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya Sûriyê zêde bûye. Herwiha Daûd destnîşan kir ku hikumeta veguhêz a Şamê rê dide DAIŞ’ê ku xwe zindî bike û kiryarên ku niha li Sûriyê dibin vê yekê tekez dikin.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Piştî ketina Rêjîma Baas û hatina hikumeta veguhêz a Şamê xeteriya DAIŞ’ê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde bûye. Ji ber ku ji dema ku hikumeta veguhêz a Şamê hatiye li ser desthildariyê, Sûriyê di nava loziyeke mezin de jiyan dike. Herwiha hikumeta veguhêz a Şamê bi hişmendiya DAIŞ`ê komkujiyan li dijî tevahiya gelê Sûrî pêk tîne.

Derbarê xetriya DAIŞ’ê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdevkê Fermî yê Hêzên Sûriya Demokratîk Ebcer Daûd ji Rojnameya me re axivî.

**‘Xeteriya DAIŞ’ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya Sûriyê zêde bû ye’**

Ebcer Daûd anî ziman ku hikumeta veguhêz a şamê rê dide DAIŞ’ê ku xwe zindî bike wiha got: “ Tu cudahî di navbera hikumeta veguhêz a Şamê û DAIŞ’ê de tune ye. Ji ber ku ev hikumeta bi hişmediya DAIŞ’ ê rojan e komkujiyan li dijî gelên Sûriyê pêk tîne û kiryarên ku niha li Sûrî diqewimin vê yekê tekez dikin. Helbet ev jî dibe derfetek li pêşiya DAIŞ’ê ku xwe di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ji nû ve zindî bike. Di heman demê de, piştî ketina rêjîma Baasê, li gelek deveran tevlîhevî û valahiyek ewlehiyê çêbû, ji ber ku leşkerên rêjîma Baas çek û embarên xwe bêyî ku radest bikin hiştin û bi vî awayî şaneyên DAIŞ’ê gelek çek û cebilxaneyan bi dest xistin, li gelek deveran dixwazin ku êrişên xwe bidomînin. Kiryarên ku niha hikumeta veguhêza a Şamê li dijî gelên Sûriyê pêk tîne. Herwiha hewldanê vê hikumetê rê didin çeteyên DAIŞ’ê ku êrişên xwe pêk bînin. Ruxmî ku Hêzên Sûriya Demokratîk dawî li hebûna DAIŞ’ê anîn, lê hebûna wan di aliyê hişmendî de hîn jî heye. Di heman demê de, gelek şaneyên DAIŞ’ê yên veşartî hene û hewl didin ku li dijî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya Sûriyê êrişan pêk bînin.”

**‘Operasyonên me li dijî şaneyên DAIŞ’ê yên veşartî berdewam dikin’**

Ebcer Daûd eşker kir ku xeteriya DAIŞ’ê zêde bûye û wiha berdewam kir: “ Di demên dawî de di Sûriyê de gelek guhertin pêk hatin, van guhertinan derfet da şaneyên DAIŞ’ê ku liv û tevgera xwe zêde bikin û êrişan pêk bînin. Di heman demê de ew sûdê ji valahiya li hin deverên Sûriyeyê digirin. Kampa Holê jî yek ji cihên sereke ye ku şaneyên DAIŞ’ê hewl dide ku xwe bigihînê. DAIŞ dixwaze li komapa Holê êrişan pêk bîne. Helbet ev yek metersiyeke mezin li ser tevahiya cîhanê çêdike, ji ber vê yekê pêwîst e ku hêzên navdewletî bi erkê xwe rabin û vê yekê paşguh nekin. Oprasyonên me li dijî şaneyên



DAIŞ’ê yên veşartî berdewam dikin û ji bo ku xeteriya DAIŞ`ê ji holê rabe, divê em têkoşînê berdewam bikin. Çawa ku 13 salan li pêşiya çavên cîhanê şervanên QSD`ê YPG û YPJ`ê li dijî DAIŞ`ê têkoşîn û berxwediyeke bêhempa dane meşandin û heta îro jî ev têkoşîn berdewam dike. Lewma ji bo ku xeteriya DAIŞ’ê ji holê rabe, pêwîst e em asta têkoşînê xurt bikin û operasyonên xwe yên li dijî şaneyên DAIŞ’ê yên veşartî berdewam bikin.”

**‘Pêwîst e em di aliyê ewlehî û parastinê de baldarbin’**

Ebcer Daûd axaftina xwe wiha domand: “Pêwîst e zarok û malbatên DAIŞ’ê yên li kampan werin perwerdekirin, da ku hişmendî û hizrên wan were guhertin. Ji ber ku zarok û malbatên DAIŞ’ê li ser kuştin, serjêkirina û xwînê hatin mezinkirin. Herwiha gelek girtîgeh li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê çeteyên DAIŞ’ê yên herî sûcdar li wan girtîne, ev çeteyên di van girtgehan de hertim pilan dikin ku ji zidanan birevin. Di heman demê de, şaneyên DAIŞ’ê yên veşartî di girtîgehan de dixwazin ku êrişên xwe pêk bînin, ji ber vê yekê pêwîst e em di aliyê ewlehî û parastinê de baldar bin.”

**‘Pêwîst e dewletên navdewletî mijara xeteriya DAIŞ’ê bi aweyekî cidî bigirin dest’**

Berdevkê Fermî yê Hêzên Sûriya Demokratîk Ebcer Daûd axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Pêwîst e hêzên Navdewletî mijarên xeteriya DAIŞ’ê bi aweyekî cidî bigirin dest. Ji ber ku divê demê de xeteriya DAIŞ’ ê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya Sûriyê zêde bû ye.”

## Şoreşa 19’ê Tîrmehê li Siwêdayê jî vejîn dibe!



**Dilyar Cizîrî**

Ev çend roj in li parêzgeha Siwêda ya li Başûrê Sûriyê aloziyeke dijwar tê jiyankirin. komên çete yên girêdayî dewleta Tirk û Hikûmeta Veguhêz a Sûriyê di bin navê hêza eşîrên ereb êrîşî parêzegehê dikin. Di rojên destpêkê yên êrişê de komkukujiyên mezin li dijî gundên parêzgeha Siwêdayê ku piraniya şêniyên wê Dirzî ne, pêk hat. Hovîtiya êrişkaran ji dîmenên wan bi xwe weşandin, diyar dibû.

Li Siwêdayê serê mirovan hate jêkirin, êşkence li dijî kesên bi temen, jin û ciwanan hate kirin. Bi sedan mal hatin talankirin û paşê hatin şewitandin. Li Siwêdayê komkujiyên li Perava Sûriyayê hate dûbarekirin. Lê tişta herdû komkujiyan ji hev cûda dike, li Peravê hêza berxwedanê di nava Ewlewiyan de nehiştin. Li Siwêdayê civakê bi hêza xwe berxwedanek mezin nîşan da. Herêmên xwe parastin û herêmên ji aliyê çeteyan ve hatibûn dagikirin, rizgar kirin.

Berxwedana li Siwdayê têkoşîna Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Şengalê ya li dijî DAIŞ’ê nîşan dide. Yenî tevî komkuijiyan û hovîtiya êrişkaran, Berxwedana Gelê Durzî cihê şanzî û kêfxweşiya hemû hezkirê mirovahiya azad in. Hejmarek mezin a çeteyan hatin kuştin, herêm bi temamî ji çeteyan hate paqijkirin. Çete û hêzên piştgiriya wan dikin, neçar man hemû şertên Durziyan qebûl bikin.

Ev bi xwe serkeftina herî mezin a gelê Siwêdayê ye. Di van rojên em behsa Berxwedana Siwêda û gelê Dirzî dikin, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê salvegera Şoreşa 19’ê Tîrmehê pêşwazî kirin. Berxwedana li ser esasê pradîgmaya Netewa Demokratî ya xwe dispêre sîstema biratiya gelan û jiyana hevbeş pêş ket. Civaka herêmê li ser bingehê parastina rewa karîbû di nava 13 salan de sîstema xwe ya xweser pêş bixe û li dijî hemû cûreyên êrişan serkeftinên mezin bidest bixin. Berxwedana Behsa mijarê piştî têkbirina çeteyên DAIŞ’ê belavî herêmên wekî Reqa, Dêrazorê û herêmên din ên piraniya niştecihên wê erebin, bû.

Li wan herêman jî niha sîstema xweseriya demokratîk pêşengiyê dikin, civak bi hemû rengê xwe sîstema xwe ya demokratîk ava kiriye. Civakê sîstema xwe ya parastinê avakiriye. Dewleta Tirk, Hikûmeta Şamê û çeteyên DAIŞ’ê gelek caran li dijî herêmê êrîş pêk anîn, lê di hemû caran de, êrişkar dihatin têkbirin. Gelê herêmê berxwedanek mezin li dijî êrişkaran nîşan didan. Sala derbasbûyî jî çeteyên rêjîma rûxyayî ya Esed, çeteyên dewleta Tirk û şaneyên razayî yên DAIŞ’ê di bin navê eşîran êrişî herêmê kirin. Carde jî nikarîbûn hevgirtina civakî têk bibin. Berûvajî êrişkar têk çûn û berxwedana civakê serdiket. Tişta îro li Siwdayê tê jiyankirin, beriya niha li gelek cihên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye jiyankirin. Heger îro gelê Siwêdayê li ser esasê parastina rewa û şerê gelê Şoreşger xwe birêxis tin dike, bê guman dê serkeftina wan misoger be.

Me gelek dîmenên ji Siwdayê derdikeve dîtin. Raste dîmenên komkujî, talan, wêranî, kuştin û her wekî din tê de hene, lê pêwîste dîmenên hêviya jiyanê zindî dike, jî bibînin.

Me di dîmenan de dît çawa gelê Siwêdayê li ser bingehê Şerê Gelê Şoreşger xwe rêxistin kiriye, malbat xwarinê ji şervanan re amade dikin. Jinên Durzî di çarçoveya parastina rewa de çek rakirine. Lê zêde bike, hevgirtina civakî serkeftin û belavbûna şoreşa 19’ê Tîrmehê nîşan dide.

# Kuantum kêrî çi tê?

**Volqan Elî**

Ferezî yan jî teoriyeke pir berfireh e kûantûm. Bi vî halê xwe qet kêrî me nayê. Tu bikevî nav, ji hejmar û fikrên ecêb ecêb nikarî serê xwe rakî: mîna xîza di behrekê de... Lê hemû aliyê wê ne ewqas çetin e. ya din jî aliyê wê yê bi jiyanê re rasterast eleqadar heye; hîkmet û felsefeyeke jiyanê ye. Dîsa jî ew jî bi qasî şiklê xwe yê ferezî yan teoriyê tevlî hev, têra xwe qerebelix bi sergêjahî ye. Ruxmî vê, du rêgez yan taybetmendiyên vê hîkmetê hene ku wekî ronahiya finda di şeveke tarî de rê pêş me dike: ya yekê, di jiyanê de qural û qêdiyên pir cemid, neguher tine; ev di asteke mezin de hişmendiya me nerm û muteherik dike. Bi vê, dibe ku qalib û dogmayên li ber jiyanê asteng in, werin derbaskirin. Ya duyemîn; jiyana pêşerojê, ji niha de bi temamî ne diyar e. Ji bo pêkhatina jiyanê gelek zêde îhtimal hene. kîjan hêzên civakî bi rêxistinî bin, bi amadekarî bin pêşeroj, jiyan li gorî wê şikil digire.

15’ê Tebaxa 1984’an li Dihê û Şemzînan li dijî dagirkeriya Koma-ra Tirk, guleyê destpêkê hatibû teqandin. Bîlançoya vî şerî yê xwînavî gelek caran ji aliyê dijmin û hêzên welatparêzve kêm-zêde hatiye dayin. Ji vê zêdetir, em ê li ber ronahiya vê hîkmet û felsefeya kûantumê li du bûyerên dîrokî temaşe bikin:

Niha yek ê bêje “ma çi eleqaya felsefe û ‘guleya’ 15’ê Tebaxê yan jî bûyera vê dawiyê bi hev re heye?” Çawa tine! Hem jî ev eleqa ne hirde-virde ye; bi qasî erd û ezman e. Ji beriya 15’ê Tebaxê gelê Kurd bi her tiştî xwe ve koleyê dagirkeriyê bûn. Ya herî girîng jî koletî di hişmendiya me Kurdan de bû. Vê ‘guleya’ ji şewqê, wekî Zilfiqara Hz. Elî, ew girêdana koletî ya di mejiyê me Kurdan de qetand. Qalib û dogmaya koletiya di mejiyê gelekî de pê tarûmar bû. Êdî Kurdan karîbû bi jiyaneke azad bifikirin. Dema em vê dibêjin, derbeya li dijî dijmîn ketî yê vê hemleyê bê qîmet nabe! Dibe ku di van hemleyên destpêkê de çend leşkerên dagirkeriyê miribin lê ya herî girîng jî ‘guleya’ku li hişmendiya wî jî ketibû: “gelo muhayel Kurdistan li vê derê ne meftûn e”. Lê belê ev rastî ti car îtiraf nekir; her got “ez ê di çend saetan de, di çend rojan de, di vê operasyonê de kokê şervanên azadiyê biqelînim. Jixwe min ev yek, li Agirî û Dêrsimê kiribû!”

Ji roja destpêkê ya koletiya li ser gelê Kurd, heya bi pêvajoya dagirkeriya Tirk her xwestine qalib û dogmaya koletiyê di mejî û jiyana Kurdan de kûr bikin. Hêzên azadîxwaz ên gelê Kurd ti car serî netewandin e. Lê mixabin ji ber rêbazên têkoşînê her têkçûne. Vaye herî dawî Tevgera Azadiyê di vê de nûbûnek kiriye: têkoşîna li ber ronahiya zanist û felsefeyê.

Çawa ku hemleya 15’ê Tebaxa 1984’an qalib û dogmayên koletiya di mejî de tarûmar kiribû... bi heman armancê vê carê jî 11’ê Tîrmeha 2025’an, şervanên azadiyê bi fermandar û şervanên xwe, xwe berdabû qada şer. Ew bi amadekarî bûn, di asta herî bilind de bi rêxistinî bûn. Her kêliya vê hemleyê li İmraliyê hatibû honandin, di mejiyê şervanên azadiyê de ‘civaka Demokratîk’ şenber bibû. Lê ferq û cudahiyek ji hemleya Tebaxê hebû... Vê carê li qada şer, dijmin yan jî fîzîka dijmin, cisma dijmin tine bû. Ya ku li holê hazir û amade bû vê carê ji serî heya binî hişmendiya dijminatiya mirovahî, çanda şer bû! Di vê kêliya dîrokî de dijminê şervanên azadiyê, ‘çanda şer’ yanî di manaya remzî (sembolîk) de çekên wan ên di destên wan de bûn. Naxwe, ji bo her şervanê/î ‘çeka’ wê/î bûka çavên wan bû. Dil nedibirin ku rojekê tozek li ser bikeve yan tiştek pê were. Lê ew fedayiyên azadiya gelan bûn. Eger bihata xwestin amade bûn, di her kêliyê de canê xwe jî bikin hezar qet. Di berdêla çi de? ‘Çanda Şer’... Hem çekên xwe feda kirin û hem jî ev çanda bêbext tine kirin. Lê dîsa jî her der nebû cinet. Tenê nîşan dan ku divê ‘çanda şer’ were tinekirin... Ji bo Hişmendiya Azadiyê rê vekirin. Astengên li ber azadiya mejiyê civakê ji holê rakirin, qalib û dogmaya ‘bikuje, bimire’ di mejiyê dost û dijmin de şikênandin.

Hem jî ji serî heya dawî ji bo afirandina civakêk nû bi amadekarî bûn!




# Li Sûriyê hêvî bûn komkujî

Parêzer Basil Ebdê diyar kir ku siyaseta hikumeta Şamê li ser înkar û dûrxistina bi zorê ya pêkhateyan e, herwiha tiştê niha tê kirin berdewamiya zihniyeta navendî ye û eger ev dewam bike, wê Sûriyeke demokratîk neyê avakirin û got, “Hevkariya Sûriyan wê siyasetê ji destê hêzên leşkerî û nejadperesetî derxîne."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Sûriyê welatekî pirenge ku gelek pêkhateyên wê hene, her pêkhateyek rengekî nîşan dide, xweşbûna Sûriyê jî di vê yekê de diyar dibe. Pêkhateyên Sûriyê tu carî li hemberî hev bi rengê kîn nehizrîne, lê asta ku hişt ev yek di nava pêkhateyan de bê avakirin, avakirina dewletan bû. Dewlet windakirina rengê pêkhateyên Sûriyê bû. Ji dema avabûna dewletê Sûriyê qeyranên mezhebî, olî û hwd… jiyan dike. Her çiqas serokên dewleta Sûriyê hatine guhertin, lê zihniyeta paşguhkirina pêkhateyên Sûriyê eynî zihniyet bû. Sûriyê bi talanên mezin jiyan kiriye, bi guhertinên mezin re rû bi rû maye. Her hikumetek ji bo ku sûcê xwe rewa bike, hiceteke derdixe, hikumeta veguhêz jî bi hincetên derew kuştina Sûriyan ji xwe re rewa kir, heya niha jî ev yek berdewam dike, li beravê me dît, niha jî Siwêdayî vê jiyan dike? Lê gelo piştî wêrankirina tam a Siwêdayê wê dor a kê be, ji bo rewakirina sûcan li ser wan? Ya ku mirov xemgîn jî dike ku ev yek li pêş çavên cîhanê tê kirin, lê mirov hîs dike ku em li cîhaneke bê çav û guh in jiyan dikin. Niha jî li Sûriyê hêvî bûn komkujî.

Derbarê nêzîkatiyên hikumeta Veguhêz a Şamê ku li hemberî pêkhateyên Sûriyê dide meşandin, endamê Şaxê Yekîtiya Parêzeran li Qamişlo, parêzer Basil



Ebdê ji Rojnameya me re axivî.

**‘Siyaseta Şamê li ser înkar û dûrxistina pêkhateyan e’**

Basil Ebdê diyar kir ku siyaseta hikumeta Şamê li ser înkar û dûrxistina bi zorê ya pêkhateyan e û wiha got: “Rêngê rêjîma Baas a berê û rengê hikumeta veguhêz a Şamê li ser siyaseta înkar û dûrxistina bi zorê ya pêkhateyan e. Li gorî siyasetên wan tu qebûlkirineke wan ji pirengiya Sûriyê re yan mafdayîna pêkhat, ol û netewên Sûriyê re tuneye. Tiştê ku niha tê kirin berdewamiya zihniyeta navendî ye, tenê zimanê wan hatiye guhertin. Hikumeta veguhêz nikarîbû daxwazên gelên Sûriyê yên azadî û wekhaviyê pêk bîne. Ew nêzî gelên Sûriyê dibe wekî ku gel kole û bindestê wan be, ne wekî ku hevkarên wan be.”

**‘Bi navê qonaxa veguhêz dewleteke navendî û desthilatdar ava bike’**

Ebdê eşkere kir ku dewamiya rengê ku Sûriyê niha pê jiyan dike tarîbûna siberoja wê ye û wiha pê de çû: “Heger siyasetên hikumeta veguhêz a Şamê bi vî rengî berdewam bike, wê siberoja Sûriyê ji bo gelan tarî be. Avakirina Sûriyeke nû bi hişmendiya Baas ne pêkan e. Ev hikumet sedemên têkçûna rêjîma hilweşyayî li ber çavan nagire û dixwaze careke din bi navê qonaxa veguhêz dewleteke navendî û desthilatdar ava bike. Heger ew vê yekê dewam bike, wê Sûriyeke demokratîk neyê avakirin, tersî wê Sûriyeke jihevketî û tijî alozî bê avakirin. Sûriyê ne tenê pêwîstiya wê bi veguhetineke teşeyî heye, lê pêwîstiya wê bi rakirin û têkbirina hişmendiya Baasî ye û jinûve avakirina Sûriyê li ser hevpeymaneke civakî ya nû ku bingeha wê pireengî, wekhevî û nenavendî be.”

**‘Bi gotin şermezar dikin û li ser erdê peymanan îmze dikin’**

Basil Ebdê di dewamiya axaftina xwe de anî ziman ku pêwîst e pirsgirêkên Sûriyê ji bingeh ve bên çareserkirin û wiha domand: “Pêwîst e hikumeta veguhêz a Şamê dest bi çareserkirina pirsgirêkan ji bingeh ve bike. Hêzên nevdewletî kiryarên li Sûriyê şermezar dikin, lê ev yek tenê bi ziman e, ew li ser erdê hevkarên hikumeta Şamê ya veguhêzin û li gorî berjewendiyên xwe pêymanan pê re îmze dikin. Ji bo pêşîgirtina li kiriyarên hikumeta Şamê, pêwîst e lêpisîneke navneteweyî li ser van sûcan bê pêkanîn. Di heman demê de destekdayîn ji bo civaka Sûriyê û hêzên demokratîk bê kirin. Hem jî şert û mercên rêzgirtina mafê mirovan û parastina sivîlan li ser hikumeta Şamê bê danîn. Herwiha divê mafê gelên Sûriyê bi taybet mafê gelê Kurd bên qebûlkirin.”

**‘Avakirina Sûriyeke nû bi biryareke nevdewletî pêk nayê’**

Basil Ebdê axaftina xwe wiha qedand: “Niha tişta tê xwestin li ser asta tevahî Sûriyê têgihiştineke giştî pêk bê. Ev têghiştin li ser bingehê wekhevî û edaletê be. Divê gelên Sûriyê têbighêjin ku Sûriyeke demokratîk nayê avakirin, bê ku gelên Sûriyê hev û çand, ziman û nasnameya hev qebûl bikin. Niha ji gelên Sûriyê tê xwestin ku hevkariyeke rasteqîne di nav xwe de ava bikin. Da ku em karibin siyasetê ji destê hêzên leşkerî û nejadpereset derxin. Pêwîst e em daxwaza destûreke sivîl, demokratî, nenavendî ji bo wekheviya tevahî welatiyên Sûriyên û mafê wan bikin. Em karibin xîtabekî nû ji bo edalet, civak û azadiyê bihevdûve girê bidin, derxin pêş. Avakirina Sûriyeke nû ya demokratîk berpirsyartiya hemû Sûriya ne, ev yek bi biryareke nevdewletî pêk nayê.”

## Xetayê 102 sal berê dubare nekin!



**Farûk Sakik**

Piştî Koma Aştî û Civaka Demokratîk, bi merasîmeke sembolîk çek şewitandin û carek din vegeriyan baregehên xwe, nîqaşên nû dest pê kirin.

Dewlet diviya di warê hiqûqî de, di qanûnên xwe de, guhertinan çêbikira da ku gerîla vegerin Tirkiyê û dest bi têkoşîna siyasî bikin, lê ev yek bi derengî dikeve. Sedem jî tecrîd berdewam e. Di şertên jiyana Rêber Apo de hin guhertinên biçûk çêbûne. Ev nayên wê wateyê ku tecrîd bi temamî ji holê rabûye.

Rêveberên Tevgera Azadiyê jî di hemû axaftinên xwe de behsa vê yekê, behsa tecrîdê dikin. Li gorî pêvajoyê ku hatibû axaftin heta îro Rêber Apo diviya bikaribiya tevlî televizyonan biba, diviya akademîsyen, rojnamevan, siyasetmedar bi hêsanî herin Îmralî û werin. Nebû. Dewamkirina tecrîdê ya ku em dibêjin jî ev e. Heger tecrîd nebûya û Rêber Apo di şertên azad te bûya dikarîbû pêvajoyê hîn leztir bikira. Heger ev yek pêk bihata berî merasîma çek şewitandinê, wê di qanûnên Tirkiyê de guhertin çêbibûna û wan gerîlayên ku çek şewitandin wê berê xwe bidana nav siyaseta demokratîk. Ji bo vê yekê têkoşîna herî lezgîn têkoşîna azadkirina şertên jiyana Rêber Apo ye. Ji bo ku rê li pêşiya azadiya Kurdistan veke divê Kurd jî rê li pêşiya azadiya wî vekin.

Dema ku em li siyaseta li Îmrali dinêrin, siyasetek ku bi zanebûn tê meşandin dibînin. Çend kes li sekreterya hatî zêdekirin, malbat diçin hevdîtinan vedigerin, heyeta Îmrali dem bi dem diçe serdanê. Ji bilî van tiştan tu tiştek û guhartinek çênebûye.

Erdogan jî di 21’ê Tîrmehê de, dema ku ji Qibrisê vedigeriya di balafirê de bersiv dida pirsên rojnamevanan û digot, “Abdullah Ocalan erka xwe pêk aniye. Dewlet jî di demek kurt de wê li Meclisê hin gavan bavêje.” Kurd divê li benda van gavan nesekinin. Ji bo wan, têkoşîna esas li dijî tecrîdê were dayîn e. Têkoşînek din jî; herkes ji îro de plansaziya xwe bike. Ji xwe re nexşerêyek derxe. Bifikire ka çawa dikare tevlî vê Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratik bibe. Li bakurê Kurdistanê di warê çand, huner û ziman de hin pêşketin hene. Divê ev werin xurtkirin. Tu kes li benda komîsyona Meclisê nemîne. Dibe ku avakirina komîsyonê bi derengî keve. Dibe ku di tecrîdê de israr bikin. Dibe di siyaseta meclisa Tirkiyê de li hevkirinek çênebe. Hin hêzên dijberên aştiyê li pêşiya van biryarên meclisê bibin asteng. Lê kesên bi banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk bawerî anîne divê, navber nedin têkoşîna xwe.

Dewlet jî divê ji dîroka xwe hin dersan bigire. Aha va 24’ê Tîrmehê û 102’yemîn salvegera peymana Lozanê ye. 102 sal bere dîsa li Meclisê nîqaş wek îro, di navbera mebûsên Kurd û Îsmet Înonu de derbas dibûn. Di rojên ku li Lozanê nîqaşên kêmaran dihat kirin de, Înonu digot ‘Kurd ne kêmar in. Em jî wek gelên Tirk xwediyê vî welatî ne.’

Lê piştî peymanê, li Meclisê bi du înkara Kurdan ketibûn. Kurd hatin înkarkirin. Ew jî her tim dibin desthilata hêzên hegemon de man. Zirarên mezin dîtin. Ji dijmintiya Kurdan wext nedîtin ji bo bextewarî û aramiya gelên xwe siyaset bimeşînin.

Heger dewlet îro bawerî anîbe, di dîrokê de bê Kurdan winda kirine û 102 salên din winda neke, divê ji arşîvên Meclisê axaftinên serdema Lozanê binêre û ji wan ezmûnan bigire. Komîsyonên ku Rêber Apo destnîşankirî ava bike û ew qanûn demildest werin guhertin. Bi kurtasî rê li pêşiya siyaseta demokratîk veke.

# Salvegera 102’emîn ya peymana Lozanê

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Peymana Lozanê di 24’ê tîrmeha 1923’yan de li bajarê Lozanê di navbera dewletên Brîtanya, Fransa, Japonya, Yewnanistan, Romanya, Sirbistan û Tirkiyeyê de hate îmzekirin. Hêzên emperyalîst bi Peymana Lozanê axa Kurdistanê parçe kirin û radestî dewletên dagirker Tirkiye, Îran, Sûriye û Iraqê kirin. Bi biryara Peymana Lozanê Kurdistan hate dabeşkirin û dagirkirin.**

102 sal di ser peymana Lozanê re derbas bû. Bi peymana Lozanê Kurdistan kirin 4 parçe. Kurd û Kurdistan di nava sînorên Îran, Iraq, Sûriye û Tirkiyeyê de hat dabeşkirin. 102 sal di ser peymanê re derbas bû û heta niha jî Kurd ji bo destxistina mafê xwe li her çar perçeyên Kurdistanê têkoşîn dikin.

Peymana Lozanê, peymaneke ku di 24’ê tîrmeha sala 1923”an de di navber Hevalbendên şerê cîhanê yê yekem û Civata Navneteweyî ya Mezin ya Tirkiyê li bajarê Lozanê hatiyeîmzekirin. Bi vê peymanê, welatê Kurdan (Kurdistan) hatiye dabeşkirin û di navbera dewletên Tirkiyê, Îran, Iraq û Sûriyê de hatiye parvekirin. Bi vê peymanê, Peymana Sêvrê ku berê di navbera hevalbendan û Împeratoriya Osmanî de hatibû îmzekirin hatiye betalkirin. Peymana Lozanê di dema ya salên




1922-23”an de hatibû gotubêjkirin û li bajarên Qesra Rumine û Lozan a Swîsreyê di 24 tîrmeh sala 1923an de hate îmzekirin. Peyman bi fermî bi heceta nakokiyên ku di destpêkê de di navbera Împeratoriya Osmanî û Fransa, Îtaliyayê, Birîtanî, Yewninistanê, Serbistanê û Romanyayê de ji destpêka Şerê Cîhanê yê yekem ve hebû hatiye lidarxistin. Nivîsara resen û orîjînal ya peymanê, bi zimanê ferensî ye.

**Binpêkirina mafên Kurdan**

Ismet Inono li konferansê aniye ziman, ku ew li ser navê Tirk û Kurdan tevilê konferansê dibe lê di dawiyê de tu mafên kurdan nehatine parastin. Ji xeynî Îsmet Înonû, nûnerek bi navê Zulfî Tîgrel (Zulfîzade Zulfî yan jî Zulfî Bey) bi wan re çûye Lozanê û li wê derê, vî Zulfîyî gotiye ku ew li ser navê Kurdan li wir e û tu daxwaziyeke Kurdan tuneye. İnönü û Tigrel bihev re Kurd rasterast bê war û welat hiştine. Aliyên Lozanê û tirkan, li ser kurdan, di rojekê de li hev kirin û ku êdî careke din qet qala kurdan li Lozanê çênabe. Peyva Kurd yek carekê jî di nivîsara peymanê de derbas nabe.

Piştî derkirina hêzên Yewnanê ji aliyê artêşa tirkan bi seroktiya Atatûrkî, hikûmeta nû ya tirkan Peymana Sêvrê mandel kir. Danûstandin di Konferansa Lozanê de dest pê bûn. Ismet Inono nûnerê tirkan bû. Danûstandinan çend mehan vekêşan. Li 20ê Çirya Pêşîn 1922yan, konfransê dubare dest bikarê xwe kir. Di 4ê Sebata 1923yan, Konferans sekinî. Di 23ê nîsana 1923yan de nîqaş ji nû da dest pê bûn û di 24ê Tîrmeha 1923yan de lihevhatin hat morkirin. Bi vî awayî hêviyên kurdan avê re çûn.

Peymana Lozanê, tevî hin lihevhatinên dewleta Tirkiyê yên din, hate temam kirin û Kurdistan di navbera Tirkiyê, Sûriyê, Iraq û Îranê de hate dabeşkirin. Di her beşê de tevahiya berhemên hebûna gelê Kurd, ketin ber talankirin û pişaftina Tirk, Ereb û Farisan. Li hemberî evqas zehmetiyan jî, Kurdan ti carî dev ji tekoşîna serxwebûn û azadiyê bernedan û hewl dan ku di her keysê de serbixwe bibin

Rastiya gelê Kurd û Kurdistanê, ku tê daxwazkirin, da ku ji dîrokê bête rakirin, ne çîrokeke mitolojîk e, ku “sê-çar dabeşkeran” li hev anîne, lê belê rastiyeke berbiçav ya raborî û îro ye. Ev rastiya ku şemaran (înkarê) napejirîne, ji nav belgeyên dîroka şemarokan (înkarvanan) difûre.

Bi Peymana Lozanê re pêvajoya qirkirin û tunekirinê ya li dijî Kurdan jî hat destpêkirin û heta îro jî didome. Dema ku Peymana Lozanê hat kirin Kurd ji aliyê leşkerî, siyasî, diplomasî û aborî de xwedî hêz û rêxistinê nebûn. Lê îro rewşa Kurdan ne weke ya wê demê ye. Kurd îro xwedî hêza leşkerî, siyasî, aborî, dîplomasî ne. Di vê dema ku tê xwestin Lozaneke nû pê çêkirin de wê Kurd jî xwedî helwest û gotin bin. Gelê Kurd di vê dema ku hewl tê dayîn Lozan were nûkirin de êdî naxwaze çarenûsa sed sal berê bijî.